



Gundê Heredanê | Pîran | Dîyarbekir

folklorame

Hejmara 1. | Adar • Nîsan • Gulan 2019

folklorame

Zargotin pişt e, folklor her tişt e!

Hejmara 1. | Adar • Nîsan • Gulan 2019

Biha: 15 ₺



WEQFA
MEZOPOTAMYAYÊ

WEQFA
MEZOPOTAMYAYÊ



WEQFA
MEZOPOTAMYAYÊ



Pîra Zero, 1951-



folklorame

f





SPAS JI BO ALÎKARÎYA WAN

Dûrzan Cîrano
Eşref Bolumcu
Ferhat Arslan
Mazlûm Sîyabend
Selmet Guler
Ugur Sermîyan
Tehsîn Baravî
Zeyneb Yaş

TÊKILÎ

folklorame@gmail.com 
folklorame   

Her nivîskar ji nivîsa xwe
berpîrsîyar e.

Kovara folklorê ya sê mehane

Sal: 1

Hejmar: 1

Xwedî: Li ser navê Weqfa Mezopotamyayê, Selîm Olçer

Berpîrsa Nivîsan: Gevrîye Atli

Edîtor: Eşref Keydanî

Redaksîyon: Bahoz Baran, Eşref Keydanî, Evîndar Şevîn

Desteya Weşanê:

Celîlê Celîl

Bêrîvan Matyar

Elîf Gunduz

Evîndar Şevîn

Mem Mukrîyanî

Zîya Mukrîyanî

ISSN: 2667-6443

Grafîk: Sevinç Adıyaman

Wêneyê bergê pêş: Eşref Bolumcu

Wêneyê bergê paş: Arşîva Sînemaya Rojhilata Navîn

Navnîsan: Weqfa Mezopotamyayê

Mezopotamya Eđitim Bilim Sanat Sađlık ve Kùltùr Vakfı
İktisadi İşletmesi

Urfa Yolu Üzeri, Serhat Plaza A/blok

Kat: 11 No: 29 Kayapınar/Diyarbakır

Sertifika No: 42382

Çapxane: Aliođlu Matbaacılık Bas. Yay. ve Kađ. San. Tic. Ltd. Şti.

Orta Mah.Fatin Rüştü Sk. No: 1-3/A Bayrampaşa-İstanbul

Tel: 0212 612 95 59

Sertifika No: 16919



Pirtûka pêşnîyazkirî

Navê pirtûkê: Folklor Kurmancîye
Nivîskar: Hecîye Cindî
Weşanxane: Lîs

 www.saradistribution.com



Hecîye Cindî & Zeyneva Îbo-1931



 Selmet Guler

Naverok

- 6 Rovî, dîk, kew û ordek, **Rênas Xendekî**
- 10 Şîn û rîtuêlên şînê li Tizyana Mêrdînê, **Mem Mukrîyanî**
- 22 Danasîna pirtûka “Folklorê Kurdî”yê, **Evîndar Şevîn**
- 30 Li ser kûçikan gotinên pêşîyan, **Mahîr Ugur**
- 32 Stranek, serpêhatîyek “Lê Yarê”, **Sadiq Reşwan**
- 35 Navên gundên Silopyayê, **Xalid Celalî**
- 36 Çar meselokên gundê Pîranê, **Remzîye Oncel**
- 38 Dîlok, **Vîldan Sevîm**
- 43 Nazenîn, **Mehpûs Serhedî**
- 51 Efsaneya Êlê Şaze, **Surya Human**
- 53 Cotkaryo, **Zîya Mukrîyanî**
- 55 Kevneşopîya beranberdanê li Agirîyê, **Nihat Oner**
- 58 Çend nîşe derbarê berhevkarîya edebîyata kurdî ya gelêrî da,
Mustafa Ozturk
- 64 Hebnîsk, **Gulîstan Oncu**
- 65 Hevpeyvîn bi dengbêj Feleknazê ra, **Roza Sîerra**
- 69 Ji hebûkî tirî ra mahsereyek lazim e, **Bêrîvan Matyar**
- 79 Çilbiska Şimikzêrîn, **Asmîn Üyanik**
- 89 Morfolojîya “Çîroka Bengîn”ê, **Haşîm Esen**
- 96 Peyvên kêmnas yên Pasûrê-1, **Bahoz Baran**
- 98 Lihevanînok, **Elîf Gunduz**
- 99 Çîrok û strana “Seydiko”yê, **Dildar Botî**
- 105 Dengbêjî û rista jina kurd di nava civaka kurd da, **Mustafa Borak**
- 115 Alastok û palastok, **Laleş Guler**

“Folklor me” û “Kovara Folklor Me”

Pêşîyên me gotîye, bihar bê gul nabe; “Folklor me” bihara mîletê me ye û “Kovara Folklor Me” jî guleka vê biharê ye, bi qewilê kal û pîran, gulbihar e.

“Folklor me” zevîyeka mişt kulîlk e, reng û reng e; “Kovara Folklor Me” mîna zarokên ku di nava zevîyan da kulîlkan didin hev, berkevkar e.

“Folklor me” kanî ye, kanîyeka bi kevirên şimşat lêkirî, hîmê wê zehf qewî ye û ava vê kanîyê jî deşt û newal û pal û mesîlan dinizile; ne kêr dibe ne jî dimiçiqe; “Kovara Folklor Me” dixwaze vexwe dilopek avê ji vê kanîyê çimkî ew tî ye û ji tîbûnê jî sîtemkar e.

“Folklor me” bastêq e, behîv e, benî ye; tûzik e, tolik e û kereng e li ser sifreyê, li benda xwarinê ye; “Kovara Folklor Me” çil e û çilek e, xure û nefsek e, xwarinxurê xwarina hemû dem û wextan û li ber sifreya hazir, telepkar e.

“Folklor me” stran e, govend e, geh heyran û lavij e geh dilok û mamik e; “Kovara Folklor Me” çok vedaye li ber gotinbêj û dengbêj û destanbêjan, qeyd dike gotin, qise, peyv û şorê; guh dide malî, cîran û gundîyan mîna bûka ku nuh ketîye nava malê ye.

“Folklor me” aş e û kes nemaye ku genimê xwe lê nehêraye û kes nîne ku nanê wî aşî nexwarîye; “Kovara Folklor Me” ketîye pey civatên wî aş û wî zemanî û dixwaze fêr bibe ka jin û mêrên zemanê berê di sînga şerî da çawa dikirin fedakarî; rind û gozelên beg û mîr û êl û eşîran çawa dibûn sedema şerê xwarzê û xalan e.

“Folklor me” şahî ye, dawet e û nasekine sê roj û sê şevan e, herweha şîn e, girîn e û qîrîn e; “Kovara Folklor Me” çavnêrê dara zavayî ye û zarok e, li benda cerê bûkê yê tijî gûz û mewuj û şekir e; ne bes e, ew ji bo êş û kul û kederê, delal û hewarî ye.

“Folklor me” ji me ra pişt û piştî ye; û “Kovara Folklor Me” pişt daye piştî xwe û nîyet dike ku bigere tevî piştîyê li mal û zozan û gundan, cihê xwe çêbike li nava civatê û ew bibe malê giştî ye.





Rovî dîk kew û ordek

Rênas Xendekî ►

Gotox: Mela Cemîlê Sûsikî
Herêm: Dihê/Sêrt
Berhevkar: Rênas Xendekî
Dîroka Deşîfrekirinê:
09.10.2018

Ev helbest-fabl, ji hêla melayekî dihî ve hatiye berhevkerin û nivîsîn. Mela, piştî çîroka gelêrî berhev kirî, çîrok ji nuh ve wekî helbest nivîsiye. Lê hezar heyf û mixabin em navê vî melayî vêga nizanin. Ev helbest-fabl belav bûye li deverê û Mela Cemîlê Sûsikî ew qeyd kirîye. Bi vî awayî zargotin û cureyeka nûjen ya wêjeyê ketine nava hev; zargotin, bûye çavkanîya helbestê. Heta di vê helbest-fablê da çîroka gelêrî bêtir ku ji resenîya xwe dûr bikeve tenê wekî helbest hatiye sazkerin. Ji ber vê yekê min xwest ev helbest-fabl di vir da çap bibe, da ku xwînerên folklorê kurdî ji vê şewazê haydar bibin. Yê ku helbest-fablê dibêje Mela Cemîlê Sûsikî ye, min jî ew ji bo we deşîfre kir.

Rovî (Hacî Muhemed), dîk (mela), kew (feqî), ordek jî (seyîd) e.

Şîn û
rîtuelên
şînê
li Tizyana
Mêrdînê

Mem Mukrîyanî

folklorame

Tenê tişteke digihîje keçan, ew jî şar e. Heke zarokên wê navê wê hılanîbin, “şar, şirik û xazî”yên wê didin wê keça ku navê wê lê hatiye kirin. Ku ew keç bi zarokên apê xwe ra bizewice ew şar, şirik û xazî pê ra dimînin. Lê ku bi xerîban ra bizewice, ew bi xwe dihere wan bi destê xwe dide metika xwe ya mezin.



Şîn, û rîtuêlên şînê, wekî gelên cîhanê li nava kurdan jî gelekî bi qedr û qîmet in. Hem berîya îslamê hem jî îro roj di jîyana rojane da mijareka gelekî girîng e. Mirin, wekî welidandin û zewacê ku mirov di jîyana xwe da pê rû bi rû dimîne bûyereka pir mihîm e. Ev dîyardeya han, herçiqas şexsî be jî, ji ber ku ev bûyer têkildarî civakê jî ye, ji alîyê gelek şaxên zanistî ve li gor rê û rêbazên cuda tê vekolandin. Mînak: tip, ol, arkeolojî, etnolojî, antropolojî, folklor, wêje û hwd.⁽¹⁾

“Rîtuêl, di serê ewil da, di nava jîyana civakî û çandî da herçiqas ji bo civaknasîyê bûbin mijareka balkêş û sereke jî, bere bere bi antropolojîyê ve kelîjîye. Rîtuêl, kêm zêde têkildarî nîrxên kes û koman in. Û di demên guncan da, bi awayekî sembolîk û bîn guherîn dubarekirina hin tevgerên rêzîn yên mirovan in. Gava mirov bala xwe baş bide jîyana civakî, tê dîtîn ku rîtuêl pêkhatayên pir girîng in ji bo hevgerîna civakî. Wekî din jî, bi xisûsiyetên xwe yên bingeşîn ku rolên wan yên kolektîf hene, koman bi hev ve girê didin, piştevanî û hişê civakê yê kolektîf xurt dikin.”⁽²⁾

Şîn û rîtuêlên şînê, li gundê Tizyanê ji mêj da wekî gelek gund û bajarên kurdan yên din û welat û neteweyan jî pir bi qedr û qîmet in. Wan jî ji berê da rîtuêlên şînê li gor çanda xwe rêz bi rêz bi cih anîne û neqlî nîfşên îro kirine. Ji bo ku em baş bi ber wan rîtuêlan bikevin, pêşîyê em dixwazin bala xwe bidin folklor û dîroka gundî. Herçiqas li ser dîroka Tizyanê û folklorê wê dokumenên nivîskî tune bin jî, bi hevpeyvînan ku bi navsere, zana û vekolîneran ra hatine kirin, ev nivîs hatîye amadekirin.

Ji bo maneya navê Tizyanê gelek rîwayet hene. Lê ya ku bi piranî tê qebûlîkirin; nav, ji peyva “tê-zan, tê-zayîn”ê veguherîye bûye “Tizyan.” Dibêjin Tizyan, wargeheka avzê û têzanê bûye; loma ev navê Têzan-Tizyanê lê hatîye kirin.⁽³⁾ (bnr li lêneyê 1.) Li gor angaştên navsereyan ku nehatine peyîtandin, qertafa pey “Tiz”ê “-yan” jî bi zimanê

(1) <http://turkoloji.cu.edu.tr/HALKBILIM/41.php>.

(2) <http://dergipark.gov.tr/download/article-file/117932>.

(3) Hevpeyvîna bi Hiznî Çinarî ra.



Wêneyê 1.



Li ser kûçikan gotinên pêşîyan

Berhevkar: Mahîr Ugur
Herêm: Arxa (Erxe)
Çirmixti (Çirmix)/Meletî



- Del vê⁽¹⁾ kuçik nabe.
- Dele ku xwast, sa la bar dore tiji dabe.
- Cî ye ku sa tedayî da be,
mari⁽²⁾ vêço⁽³⁾ nagare.
- Havale şiven la⁽⁴⁾ bar pêz sa ye.
- Ja bocîyan⁽⁵⁾ sa nabe.
- Kûçike ku bibe sa,
da bin dela xwa da beli dabe.
- Sa, ba⁽⁶⁾ gur va nabe haval.
- Sa, ba qaba ku nan xwarî narî.
- Sa, ba se va dabin haval.
- Sa, ba se va havalîye daka.
- Sa, bîle ku qaba ku nan xwarî te da narî.
- Sa, çiqas nas be, dara daste xwa barnade.
- Sa, da kodika ku nan xwarî da mîz nake.
- Sa, doça havdi barnadin.
- Sa; goşt daxwe, hastîyan vadaşirîne.
- Sa, goşt nahelin.
- Sa, goşte hav naxwin.
- Sa, goşte se naxwe.
- Sa, ja birçîyan gu daxwe.



➤ Sa, ja delika xwa dabe.
 ➤ Sa; ku ja⁽⁷⁾ kîjan hêle tirsi ba,
 wê dare da dare.
 ➤ Sa; ku ke⁽⁸⁾ têr kir, la bar darî wan dare.
 ➤ Sa ku pîr bû, gur pê dakane.
 ➤ Sa, la bar dare xwa⁽⁹⁾ natirse.
 ➤ Sa, la bar darî xwa camer dabin.
 ➤ Sa, la bar darî xwa dare.
 ➤ Sa, pêlî doça hav nanin.
 ➤ Sa saye me ye, tare la bar darî xalke dare.
 ➤ Sa, vêxwadî nabe.
 ➤ Sa, xwadîye xwa bîr nake.
 ➤ Sa, xwadîye xwa nas dake.
 ➤ Saya ku hû⁽¹⁰⁾ nane xalke buyî,
 la bar darî maran nare.
 ➤ Saya ku pir dare, ba maran nagire.
 ➤ Saye birçî, çav tim la bin kuna xalke ye.
 ➤ Saye birçî, gu daxwe.
 ➤ Saye birçî, poste rûn dadize.
 ➤ Saye camer, dizan nake nav mala
 xwadîye xwa.

➤ Saye çe,⁽¹¹⁾ ja cîranek xarab çetir e.
 ➤ Saye ku ba maran⁽¹²⁾ bigire,
 didane xwa ray maran nade.
 ➤ Saye ku ba xwaye xwa dagire,
 neye xwadîkirin.
 ➤ Saye ku bar şave dare, ja tirsan dare.
 ➤ Saye ku dize dake, neye xwadîkirin.
 ➤ Saye ku la bar darî xalke dare,
 neye xwadîkirin.
 ➤ Saye ku la xwadîye xwa dare,
 neye xwadîkirin.
 ➤ Saye ku ta kavir kiri, dabe⁽¹³⁾ tu je naravî.
 ➤ Saye ku ter nabûyî, la bar darî xwa nasakine.
 ➤ Saye male, ja bar eşika male ranabe.
 ➤ Saye pîs, ba xwadîye xwa dagire.
 ➤ Saye pîs, dizan dake nav male.
 ➤ Saye pîs, gur dake nav pêz.
 ➤ Saye tirsok, la bar darî xwa dare.
 ➤ Saye xalke, bar darî maran naporîze.
 ➤ Saye xalke, la bar darî maran nare.
 ➤ Ta kavirek avita saye xwa, xalk çelî⁽¹⁴⁾ tavîje.

-
- (1) Vê: Bê.
 (2) Mari: Mirov.
 (3) Vêço: Bêço, bêdarik.
 (4) La: Li
 (5) Bocî: Cureyekî kûçikê biçûk.
 (6) Ba: Bi.
 (7) Ja: Ji.
 (8) Ke: Kê.
 (9) Xwa: Xwe.
 (10) Hûbûn: Hînbûn, elimîn, fêrbûn, hewisîn.
 (11) Çe: Çê, baş, qenc.
 (12) Maran: Mirovan
 (13) Dabê: Divê
 (14) Çelî: Çilî.





Hicran Kılıçoğlu

Efsaneya Êlê Şaze

Surya Human



Goreyê vatişan ra dewe Qurmikê Êlê Şaze ra virazîyaya. Êlê Şaze macir bû o verê wextan dewê Mûrtezan ra macir kerdo, hamo Koyê Rijimî ya nayi ro. Ey wextan Êlê Şaze hêwananê xo sey qoçeron beno Koyan de çerêneno o hano Koyê Rijimî. O wext zî Rijim yew çale bîya. Tera vane Çale Rijimî. Êlê Şaze hêna rojeke hêwananê xo beno Koyê Rijimî çerineno. Honeno binê qirikê tûşkê hî ya, wexta binê qirikê tûşkê hî vînenê, şik keno uja de awe esta. Şino gêreno gêreno, hê yenî vînenê. O serê ey yenî de xo rê kîye virazeno. Uja de xo rê ware keno şên o keno dewe. Wexta qalê Êlê Şaze beno, semedî î vanê merdimêko zaf mêrxas o zor o, dizd bû. Hem dizd bû û hem zî mêrdêko çimîrd bû. Karî î timûtim dizdî bîya. Nizdî zimistanî qormê xo kenê hedri û dano wera.

Hîrê hew zî cenî Êlê Şaze estê Hêna şewekê zimistanîya serdo sipor o, zerê î şîna goştî tezi.

Her gav îna kerdo. Qormê xo kenê o wexta zerê î bişo goştî tezi, kono reyi, şîni hêwananê şarî diznêni, hono sere birnêno o weno. Hêna rojêke şewe mîyanê şewe de wirzeno, vano zerê min şîna goşt, ez şîna yew ca ra ma rê hê hêwanê hana. Wirzeno nişeno kantirê xo, şewe dînê şewe de, zimistan o zî, verê xo dano hetê Barav ser. Şîno şîno, hendî çiqas şîno yo nêzano. Şîno honêno hê axor ho cêko xirawî de. Şîno berî axorî keno ha û naleke û di hewî mêşinan xo girê dano û fineno bergîrî xo dima û kono reyi. Reyî ra yeno mîyanê mezelanê dewê Barave. Hanêno mîyanê mezelan de çîkeko sipe ho zerê hê mezêlî de û kire-kire ey ya û meyîtî anceno tewer. Ser bergîrî xo ra yeno war o hîdî-hîdî bergîrî xo û nale û mêşinanê xo dar a girê dano û şûrê xo gîno û vano:

“Hele ez şî bûnî zerê ey mezêlî de o çî yo a kir-kire çîya.”

Gorey vatişan ra Êlê Şaze merdimêko ceresun û çargûlçik bû. Tersî î çîni bû. Şîno nîzdî mezêlî, honêno hê cinçeql/keftar ho zerê mezêlî de û meyîtî anceno tewer. O meyîtî zî newe homo temernayîş. Êlê Şaze gava honêno keftar mezêlî kerdo ha, meyîtî te ra vejeno, beno weno. Wexta no mêrxas keftarî ey halî de vînenî, şîno serê mezêlî û şûrî xo vano heng dano milê ey ro, zerê mezêlî de î keno dijey û wirzeno nişeno bergîrî xo û hêwanêkî diznê înan pey bergîrî xo de girê dano û dano ra şîno. Naleke diznaya, aye zî o ca de silê xo kena. Heçî vorê zî a şewe varaya.

Wayîrî nale serê sêy wirzeno û hanêno berê axorî paştî ser o akerde yo û nale ey û mêşînî ey zerê axorî de çîni yê Hanêno rêçê lingan erdî de est ê. Wayîrî nale vano:

“Ez gerek ey rêçan bigirî û şî rêçî rêçî ez go bi-musê kam hamo dizdîyê mi kerda.”

Wêrê nale rêçan gêno û serê dewan ra şîno, şîno zerê mezelan. Gava hanêno eko hê keftar zerê mezêlî de dijêkerde yo. Wêrê nale xo rê xo vano:

“Hala hala! Ey merdim kamo no hikum kerdo? Ez gerek şî ey merdimî vînî û ey çî malê min berdo ez o ci rê helal kî û hagêrî. Hema ez gerekî ey tesbît bikerî o kamcî dewe ra yo.”

Wirzeno rêçanê xo gêno yeno dewê Qurmike.

Êlê Şaze zî hedri nale xo harda sere birnaya û cê ra veta û goştê xo zî no serê adirî ya. Wêrê nale yeno hanêno lê î ho serê adirî ya û merdimî mêrxas goştê nale powjeno.

Wêrê nale yeno silam dano Êlê Şaze o te ra pers keno, vano:

Welê naleke û di hewî mêşînê mi bîyê vînî û mi rêçê verê axorê xo ra gorta ez ameya kêyê to ra vejîyaya û vano:

“Min êro hunerî to zî dîyo û ez ameya to rê helêlî biwazî. Ez to helal bikerî.”

Êlê Şaze vano:

“Welê min kerdo. Şewî zerê mi şîyo goştî tezi. Ez ameya, min naleke û di hewî mêşînî hardê û ez wexta mîyanê mezelan ra vîyarta, mi dî yo keftarêki mîyanê mezêlî de yo meyîtek anceno û weno. Min şûrê xo gort û ez şîya min o keftar zî kîştê û ez derbas bîya ameya keyê xo. Hêwanê mi zî estê la karê mi dizdî ya, ê samedê ra ez hêwananê şarî diznena.”

Wayîrî nale şîno destê xo dano mîyanê paştê Êlê Şaze ra o hîre hewî te ra vano:

“Helal bibo to rê, helal bibo to rê, helal bibo to rê û malê min bitun to rê helal bibo, to ke a derbe daya ey cinawirî ro ti çî zî bikê ma to rê kenê helal.”

Samedê aye ra Qurmikijan ra vanê zaf zor ê. ●

Çime: Sanîye Human

Serê aye: 87

Perwerdeyî: Nêwende

Herêm: Qurmik/Licê/Dîyarbekir

Arêkerdox: Surya Human

Sere: 2015

Hevpeyvîn
bi dengbêj

Feleknazê ra

Amadekar:
Roza Sîerra





Portre/Dengbêj Feleknaz

Dengbêj Feleknaz, di sala 1963an da li gundê Zovangê yê girêdayî bajarê Mûşê hatiye dinyayê. Dîbistan nexwendîye. Di zarokatîya xwe da ji kaset û dawetan hînî stranbêjîyê bûye. Li gel stranên şahî û dawetan, di şînan da jî hînî zêmaran bûye. Xwezîya xwe bi Eyşe Şanê tîne. Ji sala 1983yan vir ve li Dîyarbekirê dijî. Bermaliya mala xwe ye. Kilamên ku dibêje hinek jê ev in: Xozanê, Gula Mala Emer hwd.

Dengbêjî, derdbêjî ye.

Dengbêj Feleknaz, li Mala Dengbêjan tekane dengbêja jin e. Ew ji destpêka avabûna Mala Dengbêjan ve, bi eşqa kilam û stranên her li wir e. Me xwest em bi vê jina hêja û xwedî vîn ra hevpeyvînekê çêbikin. Mala wê ava be ku ev daxwazîya me qebûl kir.

Dengbêjî ji bo te çi ye?

Dengbêjî, dîroka me ye; bi saya dengbêjîyê em dîroka xwe nas dikin. Dengbêjî ked û emega dayikê ye, îcata dayikê ye. Dema tişt bi serê mirovan da tê, tu dinihêrî dayik hem dilorîne hem digirî hem jî dibêje. Keder û nalîna dilê dayikê ye. Dengbêjî, derdbêjî ye.

Te kengê dest bi dengbêjîyê kir?

Di zaroktîya min da, di dilê min da hebû. Diçûm bêrîyê û min dengê xwe berdida. Di salên heftêyî da Radyoya Erîwanê hebû,


êvarê di saet 6an da (ez şaş nebim yanî) bi qasî nîv saetê kilamên kurdî derdiketin. Îcar karê gundan jî pir bû, nedihiştin em ji xwe ra vekin û lê guhdarî bikin. Wextê ku derfet hebûna me lê guhdarî dikir. Mesela digot ez dê bi dengê Meyremxan, Fatma Îsa, Arifê Cizirî, Eyşe Şan, Şêxo ji we ra pêşkêş bikim. Me guhê xwe didayê. Ez ji xwe ra kilaman ji wan hîn bûm.

Ev dengbêjîya te ji ku tê, berî te jî ji malbata we dengbêj derketine?

Min nedîtîye, xaltîyên min digotin kalê min dengbêj bûye. Dengbêjîya min jî ji wir tê. Di dengbêjîyê da tenê deng têrê nake. Çi sinaet hebe gerek di malbatê da hebe. Ez dema ku zarok bûm, gundîyên me êvarê dihatin mala me, kal û pîrên me çîrok ji me ra digotin, me jî ew dixistin bîra xwe. Îja roja din jî wextê ku em diçûn ber heywanan, ber pez û karikan, yan jî em biçûna çolê, me jî ji hev ra digot, îja wisa çîrokbêjîya min jî xurt dibû.

Morfolojîya

“Çîroka “Bengîn”ê



Di pênaseya fonksîyonê da
jî bi awayekî eşkere xuya
dibe ku li gor Proppî
fonksîyon naguhere, tenê
navê lehengan diguhere.

Loma Propp dibêje di
çîrokan da fonksîyon sabît
in, sih û yek in. Dibe ku
rêza wan biguhere yan jî
hinek kêmbin. Kêmbûna
wan fonksîyonên kêmbin jî bi
jibîrkinê ve girê dide.

Haşîm Esen



Destpêk

Vegotinên gelerî bûne qada lêkolînê ya
dîsîplînên wekî edebîyat, antropolojî,
sosyolojî û psîkolojîyê. Ew qada bêsî-
nor û berfireh bûye sedema derketina
gelek teorî û rêbazên vekolîna metinan.
Her rêbaza ku li ser metinan dixebite li
gor qayîde û nêzîkatîyên cur bi cur pêk
hatine. Ji wan teorîyan hinekan metin
kirîye bingeh, hinekan avahîsazî û hi-
nekan jî konteks kirine bingeha teorîya
xwe û li ser wê xebitîne. Teorîya Proppî
jî teorîyeka avahîsaz e.

Di vê xebatê da li ser teorîya Proppî
ya morfolojîya çîrokan tê sekinandin.
Ev teorîya ku ji sînemayê bigire heta
çîrokên gelerî, li gelek beşên hunerî
hatîye tetbîqkirin, dê di vir da li ser
çîrokeka gelerî bê tetbîqkirin. Armanca
vê xebatê ew e ku teorîya Proppî ya li
ser xebata çîrokên gelerî yê rûsî hatîye
sazkirin; gelo çiqas li çîrokên gelerî yê
kurmancî tê? Di vê gotarê da pêşî wê te-
orîya Proppî bi kurtî bê danasîn, bi dû
ra kurteyeka çîrokê bê dayîn û bi pişt ra
jî analîza çîrokê dê bê kirin.



1. Teorîya Proppî ya analîza çîrokan

Rêbaza morfolojîk ango tehlîla binyadgerîyê di nava tehlîla çîrokan da cihekî girîng digire. Propp di sala 1928an da xebata xwe çap dike (Yıldırım 2013:147). Ev xebat, di sala 1958an da ji îngilîzî tê wergerandin, (Keskîn 2016). Piştî vê wergerê teorîya Proppî di nava cihanê da bêhtir tê nasîn û bikaranîn. Armanca vê xebatê (teorîya Proppî); derxistina qayîde û rêzikên çîrokê, famkirin û senifandina çîrokê ye (Keskîn 2016).

Propp wisa difikire ku hemû çîrokên dinyayê li dor heman îskeletî pêk hatine. Ji hev cudabûna çîrokan tişteki ji rêzê ye û bere bere ew cudabûn çêdibe. Propp xebata xwe li ser çîrokên perîyan (derasayî) dike û çîrokên din naxe çarçoveya xebata

xwe. “Li gor Proppî ya girîng ne hejmara çîrokan e, ya girîng wesîfa lêkolîna ku tê tetbîqkirin e.” (Bars 2014:82).

Propp çîrokên derasayî ji hêla mijarê ve berawird dike, bi dû ra beşên ku çîrokê pêk tîne tesbît dike. Bi dû ra van beşan dide berhev. Piştî van pêvajoyan avahîyek morfolojîk derdikeve holê. Propp ji bo teswîreka rast van rewşan dide ber hev.

- a. “Kral teyrekî dide lehengê/î, teyr lehengê/î dibe devereka din.”
- b. “Kal, hespekî dide Sûçenkoyî, hesp Sûçenkoyî dibe.”
- c. “Sêrbazek kelekê dide Îvanî, kelek Îvanî dibe.”
- d. “Keybanû gustîlekê dide Îvanî, zîlamên ku ji gustîlê derdikevin Îvanî dibin devereka din.” (Propp 2011:23).

Dengbêjî û rista jina kurd di nav civaka kurd da

Mustafa Borak





Zargotin û civaka kurd


Di domana dîrokê da, her gelî, li gor rewşa xwe ya civakî, erdnîgarî, siyasî, dîrokî û her wekî din çandek afirandîye. Bi wan afirandinan danhevên mezin pêk hatine. Ew danhev ji bo civakê bûne çand; bûne kesayet, bûne berhemên hişmendîyeka hevpar. Di pêvajoya demê da ew nîrx, ew danhev kemilîne, dengizîne û moçik bi moçik di mêjîyên mirovan da neqîşîne. Di encamê da ev çand, ev hişmendî ji bo gelan bûne taybetmendî, bûne exlaq û kesayet. Bi saya zargotinê, bingeş û jorgeha civakan ya çînan, ya eşîran nêzî hev bûye û hişmendîyeka hevpar û kolektîf derketîye holê. Zargotin çiqas kemilîye, herêmên cuda, çandên cuda ji hev sûdewar bûne, li hev banîne û di meşkeka mezin da hasil bûne. Bi vî awayî di domana hezaran salan da li ser her erdnîgarîyêkê çandek û kesayetêkê şax vedaye. Ev çand, danhev û nîrx bi awayekî dîyalektîk tim guherîne, tim bi pêş ve çûne; pêl bi pêl, nîfş bi nîfş

hatine parzûnkirin, hatine kemilandin û hatine heta roja îroyîn.

Di dîrokê da gelên ku nebûne dewlet û statuyek bi dest nexistine, ji ber zilm û zor û dagirîyê derfet û îمكانên çanda xwe bi awayekî nivîskî bi dest nexistine; çanda xwe, zimanê xwe, adet û toreyên xwe bi saya folklorê dane meşandin. Gelên bindest bi wî awayî, hebûna xwe, hest û ramanên xwe parastine. Di heman demê da zimanên ku nebûne zimanên fermî û statuyek bi dest nexistine ew jî bi saya folklorê bi pêş ve çûne û kemilîne. Ne bi nivîsê be jî; bi gotin, bi kilam û bi lîstikên gelêrî, civakan xwe anîne zimanî. Bi wî awayî di navbera xwe da yekîtîya çand û zimanê xwe pêk anîne û ruhekî hevpar afirandine. Bi kurtasî gelên ku nebûne dewlet, gelên ku sazî û dezgehên xwe ava nekirine, hebûna xwe bi vî awayî berdewam kirine. Tekîn Çiftçi dibêje, “Çanda devkî tenê beşek ji folklorê ye, lê ya herî girîng e. Hemî çalakîyên zimanî



Serê Kaniyê/Riha



Rêbera Rastnivîsînê

Komxebata Kurmancîyê

Bahîz Omer Ehmet, Bahoz Baran, Behrûz Şucaî,
Deham Evdîlfetah, Dilawer Zeraq, Dilbirîn Evdîla, Evdîlwehab Xalid Mûsa, Malmîsanîj,
Mahmûd Lewendî, Mehdî Caferzade, Mihemed Teqewî, Mistefa Aydogan, Mîkaîl Bilbil,
Newzad Hirorî, Samî Tan, Şoresvan Adil, Zana Farqînî, Zulkuf Ergun



0549 440 22 20 | www.weqfamezopotamyeye.com